



Wezaretê ji bo Dibistan û Perwerdê ya NRW, 40190 Düsseldorf

15. Adar 2021
Rûpel 1 ji 3an

Ji bo hemû malbatên
zarokên wan li Eyaleta NRW
diçin dibestanan.

Yvonne Gebauer MdL

**Ji wezîrê, ji hemû malbatên zarokên wan li NRW diçin dibistanan
re, li ser destpêka xwebixwe test kirinê, nameya vekirî**

Semyanên bi rêz,

Îro bi spasiyên xwe û bi ahagdariyên girîng, ez li we vedigerim.

Di van mehên derbasbûyî de perwerdeya ji dûr ve, ji me hemûyan, taybetî
ji we re zehmetiyên mezin afirand. Serpehatiyên me ji girtin û tecrid kirina
yekem ya salek berê diyar dike ku malbatên bi zarok, taybetî yên bi yek
semyan, bi hefteyan, bi hilgirtina du baran re rûbirû mane. Em gişt bi
nirxekî bilind qebûl dikin ku li gel zehmetiyên vê pandemiyê afirandinin, ji
bo perwerdeya ji dûr ve, we bi her ahwayî alîkarî û hevaltiya zarokên xwe
kirine. Ji bo vê yekê, ez îro dixwazim, ji dil we hemûyan re spas bikim.

Pandemî, ev salek e, ji bo me bû pirsgirêka herî mezin ya sed salê.
Taybetî zarok û ciwanên me ji girtin û astengkirina gelenperî gelek
gazican dikin. Tunebûna têkiliyên civakî, danûstendina di navbera
hêmsaleyan de ya li dervayî malê, ji zarok û ciwanên me gelek tiştan
dixwaze. Ev hemû di dibistanan de tevî erkê perwerdê tê jiyîn. Ji ber wê
çendê, gelek girîng e ku derfetên çûyina dibistanan cardin were dayim.
Xwendekarên dibistanên seretayî, yên dibistanên alîkariyê û yên polên
dawîn ji 22. Sibata 2021an vir ve, bi guhertina navbera perwerdeya rûbirû
û ya ji dûr ve, dikarin dişa biçin dibistanan xwe. Serpehatiyên me yên
heya niha daye xuyakirin ku çavpêketina hevalan, mamosteyan û kesên
bi perwerdê re têkildar evqas girîng e, ji ber ku dibistan ji devereka
hînbûnê pir zêdetir e.

Niha gaveka pêşterir, anîna hemû xwendekarên ji pola 5an û pêve ji bo
dibistanan e.

Anschrift:
Völklinger Straße 49
40221 Düsseldorf
Telefon 0211 5867-40
Telefax 0211 5867-3220
poststelle@msb.nrw.de
www.schulministerium.nrw.de

Ev gav wê bi alikariya sê tedbirên li dijî enfeksiyonê, yê wekî parastin, vaksînkirin û testkirinê were avêtin.

Dibistanan konseptên hîjenî yê rast û berfireh li pêş xistinê û wan bi kar tînin. Herwiha despêkê vaksînkirina mamosteyên dibistanen seretayî û yen dibistabên alikariya taybet, kesên li dibistanan birêk û pek bi xwendekaran re têkildar dest pêkiriye. Ev hemû tekoşina li dijî pandemiye xwirtir dike.

Ji bo zû dîtin û tesbîtkirina nexweşiya Corona- Vîrûsê û hemû kesên tevî jiyana dibistane dibin, bikaribin baştir werin parastin, wê ji aliyê Hukumeta Heremê ve, ji bo hemû dibistanên navîn yê Nordrhein- Westfalenê, testên xwebixweyî yê Coronayê werin dabîn kirin. Heya Betlana Osternê wê 1,8 milyon test ji bo dibistanan werin dabîn kirin û testên yekemîn beriya betlanê werin çêkirin.

Semyanên bi rêz,

ev testên Coronayê yê xwebixwe, tevî vaksîn û tedbirên hîjenî wê ewlekariya her kesên tev li jiyana li dibistanan dibin, misoger bike.

Ji ber vê çendê îro tika min ji we ev e: Ji van testkirinên di dibistanan de bibin alikar û ji bo xwebixwe test bikin, cesaterê bidin zarokên xwe. Xwebixwe test kirin, parastinê ne tenê li dibistanê, herwiha li malên we jî diafirine.


Li wan rojên pêşiya me wê dibistan ji bo çawayê çêkirina van testan bi we yan jî bi zarokên we re tekevin têkilîyê. Hûn dikarin zanyariyên zêdetir li ser malpera Wezaretê Dibistan û Perwerdê ya bi navê www.schulministerium.nrw/selbsttests. bibînin. Zanyariyên Dema Coronayê ji aliyê revebiriya dibistanên têkildar ve, li ser wê malperê wê were tomarkitin û aktualize kirin.

Hukumeta heremê wê di roj û hefteyên pêşiya me de pêşketinên vê pandemiye ji nêz ve bişopîne. Rewş wê bi baldarî were nixandî û guhertinên pêwîst werin kirin. Bingeha van hemû dedbîran, girîng girtin û parastina tenduristiyê ye. Di heman demê de, ev tedbir ji bo li ber çav girtina her zarokê û misogerkirina perwerdeyeka bi kalîte, ya di pêvejoya di dibistanan de ye.

Em wekî Hukumeta Heremê bi tena serê xwe nikarin wanan bi cih bikin. Vê kiriza hanê em ê bi alikarî û hevkariya hev li paş bihêlin.

Ji ber van sedeman, ez ji we seymanan tika dikim, di van demên dijwar de berdewamî alikarî û hevkariya zarokên xwe bikin.

Ez ji bo hevkarîya we spas dikim. Li ser têgihîştina we hêvîdar im. Biminin di xweşiyê de.



Yvonne Gebauer